



LEWerger

Kovara Wergera Helbestê Ya Çarmehane
Rezber - Kewçêr - Mijdar - Berfanbar

SAL 3, 2024

7
HEJMAR



Pêşgotin

Silav xwînerên delal,

Silav li helbestê, li dilsozên helbestê û li payîza ku helbest herî zêde li wê tê.

Her wiha ew payîz e ku bû şitla LEWêgerê û kir ku ji wê rojê da şîn bê; ber û şax bide.

Bi demê û derketina her hejmarê ra geşedanek pêk hat. Ew geşedan e ku nîşaneyê ruhekî zindî ye. Loma jî ev yek guherînan bi xwe ra tîne û her wiha rengê xwe li LEWê jî vedide. Bi vê hejmara 7an ra ku 2 salan li dû xwe dihêle, mîna ku hûn jî dibînin me ji bergê dest bi hin guherînan kir û me dil heye ku ji hejmara 8an pê va, yanî bi hejmara sersalê ra jî em çend guherînan berdewam di naveroka kovarê da çêkin. Û dîsa, ji hejmara sersalê pê va em ê di her hejmarekê da temayekê diyar bikin û dê helbestên wê hejmarê hemû tenê ji temayekê pêk bên.

Wekî mînak: Jin, evîn, xweza û hwd..

Belê xwînerên hêja, LEWêger bi hejmara 7em bi cehd û kedeke bêhempa bi helbestên têtîje û xurt li pêşberî we ye.

Di îlona 2022an da LEWêgerê bi ked û dilsoziya gelek hezkiriyên helbestê, wekî dilopêkê xwe bera nava behra helbesta kurdî dabû. Û niha bi dilopa xwe ya 7em ciyê xwe li vê behrê zelaltir, qehîmtir û berbelavtir dike. Êdî palgeheke zexm a LEWê heye. Bi şeş hejmarên ku li dû xwe hiştî, bi xwînerên dilsoz, bi keda wergêr û wergerên xurt piştî xwe dide xwe. Ev jî kelecaneke mezin û palpişteke zexm e bo hejmarên bîn/nû.

Kerem bikin,

LEW jî ya we ye, helbest jî, payîz jî...

* * *

Spasiyeke mezin ji dilê dil bo dildar û xemxurê zimanê xwe Kek Mehmet Baykal ku sponsorê vê hejmara LEWê ye.



Kovara Wergera Helbestê Ya Çarmehane:
Rezber - Kewçêr - Mijdar - Berfanbar
Sal 3, Hejmar 7, 2024

Lijneya Weşanê
Miradê Miradan, Berfîn Huseynî, Yeqîn h.

Edîtorên Vê Hejmarê
Yeqîn h., Samî Hêzil, Ciwan Qado, Seyîdxan Kurij
Mizgîn Savci, Alan Hemo, Azad Rêbiwar

Redaksiyon
Kurmançî: **Miradê Miradan, Berfîn Huseynî, Yeqîn h.**
Xwendina dawîn: **Osman Bozkurt**
Kirmanckî: **Seyîdxan Kurij**
Soranî: **Besam Mistefa**

Grafîk
Sadik Hangül
juji tasarim (jujitasarim@gmail.com)

Pêwendî
Instagram: **@lewerger_**
X: **@lewerger_**
Facebook: **lew werger**
Mail: **lewwerger@gmail.com**

Çap
Ceylan Matbaa
Maltepe Mah. Davutpaşa Cad. Güven İş Merkezi, No: 83/317-318-319
Zeytinburnu/İSTANBUL **Tel-Faks:** 0212 613 10 79 **Sertifika No:** 40933

Navnîşan
Na & Kil Yayınları
Kitap, Gazete ve Dergi Basım, Yayım Toptan ve Perakende Ticareti.
846 Sk. No: 42 D:1 1. Beyler-Konak-İZMİR,
Mail: nayayinlari@gmail.com **Tel:** 0 507 319 72 85 **Sertifika:** 40001

ISBN: 978-625-6678-21-7

©Lew, 2024/ Hemû mafên naveroka kovarê parastî ne.
Bi tenê nivîskar ji nivîsarên xwe berpirsyar in.

N A V E R O K

<p>Pirsan ji evînê mekin / Herman Wildenway 4</p> <p>Rojên Hezîranê yên xweş / Detlev von Liliencron 5</p> <p>Evîna Min Mîna Guleke Sor Sorgevez e Robert Burns..... 6</p> <p>Dayê Roniya Royê ye / Evelyn Tooley Hunt 7</p> <p>Nehêniya şevê / Else Laske-Schüler 8</p> <p>Rêzgirtin bo Guillaume Apollinaire Blaise Cendrars..... 9</p> <p>Êdî na / Idea Vilariño 11</p> <p>Kulîlka dawîn a payîzê / Sonja Åkesson 12</p> <p>Şewat / Bedir Şakir Elseyab 13</p> <p>Payîza beqê / Sylvia Plath..... 14</p> <p>Ji te hez dikim / Paul Eluard..... 15</p> <p>Deyîra şorba / Bertolt Brecht 16</p> <p>Neponijîn / Alberto Caeiro 17</p> <p>Li bîra min e dema batinî / Aleksandr Puşkin 18</p> <p>Nav / Neeltje Maria Min 19</p> <p>Hevtawan / Jorge Luis Borges 19</p> <p>Bi valêzê sivik / Hilde Domin 20</p> <p>Biyani / Charles Baudelaire 21</p> <p>Roj nîn e îro / Rosamond S. King 22</p> <p>Xiloxavî / Radoy Ralin..... 23</p> <p>Gerdûn / Giuseppe Ungaretti..... 25</p> <p>Li cem gulfiroşê / Jacques Prévert..... 26</p> <p>Hêza beşandinê / Armen Yerimyan..... 27</p> <p>Destpêka axaftinê / Adonis 28</p> <p>Li benda min bimîne / Rena el-Tûnisî..... 29</p> <p>Naxwazim tişteki ne peyvan ne rastiyê Fernando Pessoa 30</p> <p>Gelek gelek kes hene / Maya Angelou 31</p>	<p>Maçkirina bi Vietnamî / Ocean Vuong..... 32</p> <p>Spîtiya berfa / Harry Martinson 33</p> <p>Ji Dîwana Kebîr xezela 2922 Mewlana Celaleddînê Rûmî 35</p> <p>Pîre espî bareber / Ingela Strandberg..... 36</p> <p>Wekî zarokekî / Hamo Sahyan..... 37</p> <p>Pizrûkên berfê / Robert Frost 37</p> <p>Tiştta ku dê xewnê nêzikî rastiyê bike, dubarekirin e / Miqdad Xelîl..... 38</p> <p>Evîn tê û evîn dihere / Nils Ferlin..... 41</p> <p>Biçûkiyek / Erich Fried 42</p> <p>Şeş Haikû / Jack Kerouac..... 43</p> <p>Kawik / Jacques Prévert..... 44</p> <p>Strana Evînê ya J. Alfred Prufrock / T.S. Eliot 45</p> <p>Şewa serde ya zimistanî de / Nima Yushij..... 50</p> <p>Dagerîna Şevê di Parzemîna Rojê de Sheida Mohamadi..... 51</p> <p>Odeya Spî / Charles Simic 52</p> <p>Tu çuyî / Bedir Şakir Elseyab 54</p> <p>Ji bo Jane / Charles Bukowski..... 55</p> <p>Hewayaya kemilî / Emerenz Meier 56</p> <p>Havîn li çiyayan / Edith Irene Sodergran 57</p> <p>Sonatin / Anna Greta Wide 57</p> <p>Li dikana gulfiroşê / Jacques Prévert 58</p> <p>Westiyame / Arpenik Charents 59</p> <p>Hate Ba Min / Selwa Ismaîl..... 60</p> <p>Ba Rûnî Bikemewe / Shook 61</p> <p>A li vir im / Charles Bukowski..... 63</p>
--	---



Pirsan ji evîne mekin - Spør ikke om kjærlighet

Herman Wildenway (1885 - 1959)

Pirsan ji evîne mekin bê wê bidome yan na
Tu bi xwe dizanî ku nadome
Tu ji kê bipirsî jî
û tu çî bersivê bidî jî.

Ji dêvla vê pirsê, bipirse bê ka wê evîn
bi hehecikên biharê re bê yan na
ewên ku havîna xwe didarizînin
ta ku dikevin xewa payîzî û zivistanî

Pirsan ji ruhê evîndar meke!
Piştî ku biharek
û havînek were
payîz di ser hemûyan re dibore
giran û hişk
û sar...

Nepirsin gelo evîn çî sozê dide.
Belkî jî evîn raketiye
zivistaneke dirêj
dî stranekê de.

Wergera ji norwecî: Salih Agir Qoserî



Rojên Hezîranê yên xweş - Schöne Junitage

Detlev von Liliencron (1844 - 1909)

Nîvê şevê, li baxçeyan guhdêr im
Pistepista peyvan û ramûsanên evînê
Heya ku sewta dawî jê biliya
Ji ber ku divê niha her kes razê-
Bilbilek distirê li wî aliyê çem.

Keskahiya tavê wekî baxçeyê gulan
Spîtiya tavê wekî lehiya çeman
Bêdengiya tavê wekî aramiya sibehê
Ya ku bêhnê vedide li ser dar û nivînan-
Bilbilek dixwîne li wî aliyê çem.

Geremola kolanan, dûrahî, tevlîhevî
Mêrê maldar û zarokê parsek
Tacegulên darmûtikan, karwanên cenazeyan
Bi hezaran jîyan diherikin-
Bilbilek distirê li wî aliyê çem.

Êvar hêdî hêdî dadikeve
Dinyaya req nerm dibe
Û dil aştiyê dîke
Û leheng dibe zarok-
Bilbilek dixwîne li wî aliyê çem.

Wergera ji almanî: Nûwar



Evîna Min Mîna Guleke Sor Sorgevez e* - My Love is Like A Red Red Rose

Robert Burns (1759 - 1796)

“Evîna min mîna guleke sor, sorgewez
Ew e bişkiviye teze li meha Pûşperê;
Evîna min e mîna xweş awaz
Ew e nazenîn reqîsî bi ahengê.”

Wîsa pak e pêşkê te, keçê, bedewa min,
wîsa ji dil evîndar im ez;
Û ez ê hê jî hez ji te bikim, delala min,
Heta ava behran bimiçiqe tev.

Heta ava behran bimiçiqe, delala min,
Û zinar bihelin li ber hetavê;
Ez ê hê jî hez ji te bikim, dilê min,
Heta bikişin qûmên heyatê.

Êdî bi xatirê te, tekane eşqa min!
Û wextekê bi xatirê te, lê lê!
Û ez ê dîsa werim, dilê min,
Tevî ku hezar fersax jî hebe rê.

Wergera ji îngilîzî: Rizgar Elegez

* Çavkanî: Robert Burns, *Berhemên Poetik ên Robert Burns, (The Poetical Works of Robert Burns), Edited by J. Logie Robertson, M.A. r.318. Henry Frowde, Oxford University Press, London, New York, Toronto, Melbourne, 1912.*

Vê wergerê îthafî dostê xwe yî hêja, Mem Alan dikim ku wî ev kitêba çavkanî ya zehf bi qîmet ji Berlînê peyda kir û ji min ra şand. (Nota Rizgar Elegez).



Dayê Roniya Royê ye - Mama Is a Sunrise

Evelyn Tooley Hunt (1904 – 1997)

Dema ku bi pêyên xwe yên sivik tê di nava dêrî re
şewqa wê me vêdixe
wekî qoza êgir
em pê digirin û şiyar dibin.
Çirûskekê dipekine nava çavên Bavo jî
tariyê tev dehf dide.

Dema bi zimanê xwe yê şîrîn dike galegal li nava odê,
me germ dike
wekî ava girara kel,
em devbiken dibilqin û radibin ser xwe.
Di nivê şevê de jî Dayê ji me re Roniya Royê ye
mizgîniya sibetirê û rojên bê dide me.

Wergera ji îngilîzî: Samî Hêzil

Institut kurde de Paris



Nehêniya şevê - Heimlich zur nacht

Else Laske-Schüler (1869 - 1945)

Min ji nava
Stêran tu hilbijartî
Ez hişyar im- kulîlkeke bi xuşîn.
Di nehvirandina pelan de.
Lêvên me amadehiya çêkirina hingiv dîkin
Şevên me yên ronîdar vebûn
Di biriqandina bextewer a laşê te de
Dilê min asîmanê xwe pê dixê
Hemî xewnên min bi zêrên te ve piştband in
Min tu ji nava hemî stêran hilbijartî.

Wergera ji almanî: Tengezarê Marînî

Institut kurde de Paris



Rêzgirtin bo Guillaume Apollinaire - Hommage à Guillaume Apollinaire

Blaise Cendrars (1887 - 1961)

Nan hişyar dike
Fransayê
Parîsê
Serdanpê nîfşekî

Bang li hemû helbestkarên amade dikim
Hevalno
Apollinaire nemiriye
We da dû ereboka cendekan a vala
Apolinaire sêrbazek e
Ew bû yê dikeniya di hevrîşimê wan alên di pencereyan de
Kêf dikir hinga ku tac û kulîlk diavêt ser we
Hinga ku hûn derbasî pişt erebeya cendekê wî dibûn
ew hema rabû kokarteke biçûk î sêreng kirî
Heman êvarê min dît ku wa li kolanan xwepêşandanê li dar dixê
Li ser motora qamyoneke amerîkî siwar dibû
û dihejand aleke mezin î navnetewî ya mîna balafireke ferikî

BIJÎ
FRANSA

Heyam diborin
sal diferikin mînanî ewran
Leşker vegeriyan malên xwe
li malê
li welatê wan
va ye niva nîfşekî nû radibe
Xewna memikan rast digere!



Fransiyên biçûk
nîv îngilîz, nîv reşîk, nîv ûris
hinekî belçîkî, îtalî, çekî
yek xwedî aksana kanadiyan, yê din xwedî çavên hindiyan
Diran rû hestî movikên qewsikî rêveçûn bişirîn
bi tevan re tiştêkî xerîb heyê û belê
tev ji welatê me ne bêguman

Di naxa tevan de
Apolinaire, mîna vî peykerê
maka hemû avan Nîlê
veketî ye tevî sêlekên ku bi ser wî de diherikin
ji her derê

Bi nava pêgan, bi binê çengan, bi riha xwe
dişîbin bavên xwe û jê vediqetin
Û hûr û gir bi zimanê Apolinaire dipeyivin

Mijdar 1918, Parîs

Wergera ji fransî: Yeqîn h.

Institut kurde de Paris



Êdî na - Ya no

Idea Vilariño (1920 - 2009)

Êdî wê nebe
êdî na
em ê bi hev re nejîn
ez ê zarokê te mezin nekim
ez ê kincên te nedirûm
bi şev tu yê ne li ba min bî
dema çûyînê ez ê te ranemûsim
tu yê qet nizanibî bê ez kî bûm
çima yên din ji min hez kirin.

Ez ê tu carê nizanibim
ne çima ne çawa
bê ka rast bûn yan na
ew tiştên ku te digotin
ne jî bê ka tu kî bûyî
ne jî bê ka ez çî bûm bo te
ne jî wê jiyana me ya bi hev re
hezkirina me
bendewariya me
hebûna me
çawa bûya.

Ez bi xwe êdî hew ez im
heta bi hetayê
û tu êdî
tu yê ji bo min nebî
tu jî hew bi xwe tu yî. Tu yê êdî nemînî
dî rojek pêşerojê de
ez ê nizanibim bê ka tu li ku dijî
bi kê re
ne jî eger tême bîra te yan na.
Tu yê tu carê min hembêz nekî
mîna wê şevê
qet.

Ez ê careke din dest bi te nedim.
Ez ê wê kêliya mirina te nebînim.

Wergera ji îspanyolî: Jiyar Homer



Kulîlka dawîn a payîzê - Höstens sista blomma

Sonja Åkesson (1926 - 1977)

Ez kulîlka dawîn a payîzê me.
Di dergûşa havînê de hatim hejandin
wan ez kirim nobedar li hemberî bayê bakur
pêtiyên sor pijiqîn
ji hinarka min a spî.
Ez kulîlka dawîn a payîzê me.
Ez tovê herî ciwan ê bihara mirî me
ew çend hêsan e ku mirov bibe miriyê dawîn;
min ew gol wilo bi şehyan û şîn dît
min dilkutka dilê havîna mirî bihîst
peyala min ji mirinê pêvtir tu tovî hilnagire.

Ez kulîlka dawîn a payîzê me.
Min stêrcîhanên kûr ên payîzê dîtine
min ronahiya tifikên li dûr û germ dîtine
ew qas hêsan e ku mirov heman rêyê bişopîne
ez ê deriyê mirinê bigirim.
Ez kulîlka dawîn a payîzê me.

Wergera ji swêdî: Mizgîn Savci

Institut Kurde de Paris



Şewat

Bedir Şakir Elseyab (1924 - 1964)

Û ta dema ku ez laşê te yî kevirî bi agirê xwe disincirînim
Û ji destên te berfê hilk dikim, di navbera çavên me de dimîne
Aranên ji berfê ku kesê peya lê diweste
Weku tu ji mij û heyvan li min dinêrî
Wekî ji roja ku em hene, li bendê ne ku hev bibînin.
Lê belê bendemayîna evîne hevdiştin e... li ku ye dîdariya me?
Qetiya laşê te yî tazî...
Qetiya, li bin banê şevê, memikên te bi neynûkên min...
Her tişt qetiya di rivîna min de, ji bilî perdeyên min
Li min vedişêre tiştên ku di te de hez dikim.
Wekî ez xwê ji xwîna te vexwim, dimînim tî
Kê vexwariye, kanî heza te? Kanî giyanê te yî tazî?
Deriyê şevê li te digirim dûre derî hambêz dikim
Siya xwe ya li ser maçî dikim, bîranînên xwe, hin ji nepeniyên xwe...
Û di agirê xwe de li te digirim
Te nabînim, ne jî ariya te ya ku ji pêtê tê xwarê.
Ez ê xwe tevî biavêjim nava wê pêtê, her tiştên çûyî
Û her tiştên ku tên.
Min te divê, de min bikuje da ku bi te zîz bibim
Û kevir bikuje
Bi tewirîna xwîne, bi agirê xwe... û bişewite bêyî agir.

26/10/1961

Beyrûd

Wergera ji erebî: Alan Hemo



Payîza beqê- Frog autumn

Sylvia Plath (1932 - 1963)

Havîn pîr dibe, dayika xwînsar.
Kêzik kê m in û çîçelaskî ne.
Li wê dera avzêmî bi tenê em
Dikin qurrequrr û diçilmisin.

Sibeh di nava xilmaşiyê de difeşkilin
Tav bi giranî diçirise.
Di nava wan çîtikên lawaz de. Mêş li me dideynin.
Ew çirav me nesax dike.

Xwîsî xwe li pîrebokan jî dideyne. Eşkere ye
Ruhê bereketê
Li dereke din dibe mêvan. Gelê me dişikê
Bi şîngiraniyekê.

Wergera ji îngilîzî: Azad Rêbiwar

Institut kurde de Paris



Ji te hez dikim - Je t'aime

Paul Eluard (1895 - 1952)

Ji bo hemû jinên ku min nas nekir ji te hez dikim
Ji te hez dikim ji bo hemû demên ku ez lê nejiyame
Ji bo bêhna behra bêserûber û bêhna nanê germ
Ji bo berfa ku dihele ji bo kulîlkên herî pêşîn
Ji bo ajalên saf ku mirov ji wan natirsin
Ji bo hezkirinê ji te hez dikim
Ji bo hemû jinên ku ji wan hez nakim ji te hez dikim

Ger ne tu bî ma kî min vedibeyîne ku ez xwe hinde piçik dibinim
Bêyî te ez tiştê nabînim ji bilî çoleke bêserî û bêbinî
Di navbera do û îro de gelek mirî hebûn
Ku ez li ser kayê pêrgî wan tevan hatim
Min nikarîbû dîwarê neynika xwe qul bikim
Diviyabû ku ez gotin bi gotin hînî jiyane bibim
Weku em çilo ji bîr dikin

Ji bo bîrbiriya te ya ku ne ya min e ji te hez dikim
Ji bo tenduristiyê ji te hez dikim
Li dijî her tiştê ku tenê xeyal e
Ji bo wî dilê nemir ê ku ez ne xwedî me
Ku tu guman dikî tu şikî lê tu beraqilî bi xwe yî
Tu ew roka mezin î ku li serê min dixê
Gava ku ez bawer im ji xwe

Wergera ji fransî: Kevokê



Deyîra şorba - Das Lied von der Suppe

Bertolt Brecht (1898 - 1956)

Eger şorbaya to çîn bo
Ti wazenî xover bidî?
Ganî ti heme dewlet
Bin ra heta ser ters biqelibnî
Heta ke ti wayîrê şorba bî.
O wext ti benî misafirê xo.

Eger goreyê to yew kar peyda nebo
Ganî ti xover bidî!
Ganî ti heme dewlet
Bin ra heta ser ters biqelibnî
Heta ke ti wayîrê kare xo bî.
Çi kar ke semedê to ya esto.

Eger însan bi zeîfîye şîma bihuyê
Şîma nêşkenê wext vîndî bikerê
Ganî şîma pa alaquadar bibê
Heme kesî zeîf rayîr ra şîyerê
O wext şîma benê yew qeweto gird.
Yew çîyo ke hin kes pê nêhuyeno.

Almankî ra açarnayox: Seyîdxan Kurij



Neponijîn

Alberto Caero*

Neponijîn tiştêkî asayî ye li ba min; heya carna jî ji ber xwe ve kenê min bi tiştêkî tê ku nizanîm bê çi ye lê girêdana wî bi kesinan re heye ku diponijîn...

Aya derbarê siya min de, bi çi diponije dîwarê min?

Carna, ji xwe dipirsim û ji xafil pîrsa tiştinan dikim, hingê bîna min teng dibe û aciz dibim, weku ji nişka ve nigekekî min bitevize...

Gelo derbarê yê dîn de bi çi diponije evê han?

Bi min, tiştêkî de naponije;

Ma hişê erdê heye ku bîra dar û şînkahiya xwe bibe?

Ku hişê wê hebûya wê mirov bûya; û eger mirov bûya û di postê beşeran de bûya wê nema navê wê mabûya erd.

Lê nizanîm bê çi îşê min ji vê yekê heye?

Eger di van çîrokan de ponijbûma, min ê nema karîbûya li dar û rîwekan binêriya;

û ku ji fikrên xwe dûrtir nebînim, ez ê wê çaxê dev jê berdim li erdê jî binêrim û ez ê xemgîn bibim û haya min nema ji bayê felekê dimîne; lê a wiha, bê ponijîn erd û ezman mal û milkê min e.

Wergera ji almanî: Ciwan Qado

* Alberto Caero: Yek ji navdartirîn heteronomên Fernando Pessoa ye.



Li bîra min e dema batînî

Aleksandr Puşkin (1799 - 1837)

Li bîra min e dema batînî:
Tu hatî û li ber min hunurî,
Wekî horiyêke ji salên buhurî,
Wekî xasxatûna sewdasotî.

Li nava melûliya mitalên pizinî,
Li nava hêbeta bang û tevgerê,
Li min tesele bû dengê nazikî
Û xeyalên xweş hatine vê xewnê.

Sal buhurîn, têkoşîna bagerê,
Mina bûn xemên min e berê
Û min ji bîr kir dengê te ye nazik,
Nûr û nedera rind û xasik.

Li vê berbangê, tarîbara sar,
Rojên dawî li min bûne mêvan,
Bêxwediye, bê can û ruhdar,
Bê hêsir, jiyan û bê hezkirin.

Ruhê mîşyar û sivik bû gidî:
Û dîsa hatî li ber min hunurî,
Wekî horîke ji salên buhurî,
Wekî xasxatûna sewdasotî.

Û ji vê şabûnê dilê min lê dixê,
Û kêfxweşiyê berxwedêr bûme,
Û ji xwedêtiyê, can û ruhdariyê,
Û jiyanê, ji hêsiyan û ji evînê.

1825

Wergera ji rûsî: Prîskê Mihoyî



Nav

Neeltje Maria Min (1944 -)

Dêya min ji bîra kiriye navê min
û zaroka min hê bi navê min nizane.
Ez ê çawa xwe hebandî hîs bikim?

Min bi nav bike, hebûna min piştrast bike
bila wekî zincîrekê be navê min.
Min bi nav bike, min bi nav bike, bangî min bike
ax, bi navê min ê ji hinavê min bi nav bike

Ji bo yê ku jê hez dikim, dixwazim bême binavkirin.

Wergera ji holandî: Hebhinarkê

Hevtawan - El cómplice

Jorge Luis Borges (1899 - 1986)

Ew min xaç dîkin û divê ez xaç û mîx bim.
Ew camê dirêjî min dîkin û divê ez jar bim.
Ew min dixapînin û divê ez derew bim.
Ew min dişewitînin û divê ez dojah bim.
Divê pesnê her kêliyê bidim û spasdâr bim.
Xwarina min her tişt e.
Giraniya rastîn a gerdûnê, heqaret, şahî.
Divê ez tiştê ku min diêşîne rewa bikim.
Ne bextê min û ne bedbextiya min girîng in.
Ez helbestkar im.

Wergera ji îspanyolî: Jiyar Homer



Bi valêzê sivik - Mit leichtem Gepäck

Hilde Domin (1909 - 2006)

Hîn nebe.

Lazim e tu hîn nebî.

Erê gulek gulek e

lê welatek timî ne welatek e.

Bizîvire li wî boncîkê ku ji pencereyê ve teriya xwe ji te re li ba dike
dixapîne te.

Dirbê dirêjmayînê bi te nakeve.

Tu dikarî kevçiyekî bibî bi xwe re

gulekê, dibe ku dilekî

û belkî jî mezelekî

Kevçiyek baştir e ji duduyan.

Bixe stûyê xwe wî

tu dikarî kevçiyek hebî

lewre bi dest

giran dikêşe germahî.

Dê şekir biherikiya ji nava tiliyên te

wekî xemrevîniyê

wekî dilxwaziya

ku di wê rojê de

bibe ya te.

Tu dikarî kevçiyek hebî

gulek

dibe ku dilek

û belkî jî mezelek.

Wergera ji almanî: Yasemîn Acer



Biyanî - L'Etranger

Charles Baudelaire (1821 - 1867)

- Bêtir hez ji kê dikî, ka bêje lo mirovê razdar? Ji dê, ji xwişkê, ji bav an ji bira?
- Min ne dê ye, min ne xwişk e, min ne bav e û ne jî bira.
- Hevalên te?
- We gotineke welê gote min, ta îro jî di rex min de çu cih nedaye xwe û ji min ve ne nas e.
- Welatê te?
- Ji zanîna min der e, wekî ew di jêrî kîjan hêlîpanê de ava ye.
- Lê bedewî?
- Min ê ji dil hez jê bikira heke hebûya li miqabil min xwedawendek yan jî yeke nemir.
- Ê zêr?
- Ez jê dibehecin, wekî çawa hûn dibehecin ji Xweda.
- Weeh! Ê wekî wisa tu hez ji çi tiştî dikî, biyanîyê ecêb?
- Hez ji ewran dikim ez... ewrên ku dadigerin... haa li rajorê han... ewrên kaw ên nuwaze!

Wergera ji fransî: Rifat Arya

Institut kurde de Paris



Roj nîn e îro - No sun today

Rosamond S. King (1975 -)

Ne li rondikan
Lê li heyfê diçe baran
Em hemû qurbanî ne
Kes ne arî ye ji me
Ne ewle ye kes ji me
Tişt xerab in
Û em ê rehet nebin
Em ê ji nû ve bêtir bikevin temaşeya trajediyan
ji nû ve tirsên xwe bêjin
dî derbarê tolê de vereşin
Me rehetî navê hêj - me lêborîn divê
nasîn divê
bi sertewandinan re me gotina
erê ev qewimî û ev hovane ye, divê
Ne rehetî, hêj na -me li ser rûyê din
awêneya xwîn û tirs û êşa xwe divê
Me ji bîr kiriye
bê çawa û li ku
em ê li rehetiyê bigerin

Wergera ji inglîzî: Hoşeng Nizarî



Xiloxavî

Radoy Ralin (1922 - 2004)

Bi kêfxweşî min ê bixwesta, ger min karîbûya ez bibûma dînek,
Bi kêfxweşî min ê canê xwe pûç kiribûya.
Ne qîr. Ne êş. Ne jî hizrên xurcilî.
Tenê ku li ser rûyê te gîrnijîneke bêwate ronî dabûya.

Tenê yek kêlîkê û tê têkevî rewşeke wendabûnê.
Wê her tiştê te bê guhertin,
wê nediyar bibe, bimore.
Tiştêkî tu li bendê bimînî nema,
tiştêkî tu hêvî bikî tune.
Êdî ne kemîn dimînînin, ne ceng, ne dostên baş û ne dîlber.

Ger biyaniyan xwestin welatê te dagir bikin, guh nedê!
Tu dikarî di paş guhê xwe re çavdêriyê bikî
Tê bibînî çawa yekemîn dostê te dikeve kemînê.
Tişt nabe! Ne xem e ku tu ber bi dînbûnê ve biçî, qet ne dereng e!

Heye ku bi dîtina evîndara xwe bi kesekî din re tu veciniqî û baştirîn teoriya te têtê here
Tê baş bî, rêzdarê aram bî.
Wê gîrnijîna te ya bêwate qet ji ser dêmên te neçe.



Tê bibî wênesaz.

Tê gumanê bikî ku her roj rojavabûn xwe li pişt Darebiyê dikuje.

Ewr mîna meşa di bin darbestekê de diherikin.

Li ser lûtkeyên tarî dixijiqin.

Ji hev vediqetin.

Hûr meyze bike û bistirê.

Tu niha azad î.

Bihêle, tev wekî dixwazin te bibin û bînin.

Bila cîhan tev têkeve bin lêpirsînê.

Xiloxavî!

Belav ke, cansivik be

Bi bêhêvîti cîhanê hambêz bike

Bextewariyê bidê!

Jîr tîn kuştin

Rêzdar tîn kuştin

Ez naxwazim di tu tiştî de hevpar bim.

Wergera ji bûlgarî: Xurşîd Îlêwî

Institut kurde de Paris



Devetachi, 24 Tebax 1916

Gerdûn - Universo

Giuseppe Ungaretti (1888 - 1970)

Bi deryayê
Min ji xwe re
Darbesteke
Hênik çêkir

Wergera ji îtalî: Selîm Nalî Gulfiraz

Institut kurde de Paris



Li cem gulfiroşê - Chez la fleuriste

Jacques Prévert (1900 - 1977)

Zilamek derbasî cem gulfiroşê dibe
Gulînan hildibijêre
Ya gulfiroş wan jê re dike gurz
Mêrik dest dixê bêrîka xwe
ku pereyan derxe
da buhayê gulînan bide
Lê di heman demê de
ji nişka ve
destê xwe datîne ser dilê xwe
û dikeve.
Çawa ew dikeve
Pere li erdê digindirin
Paşê gul jî dikevin
Di heman demê de zilam
Di heman demê de pere
Ya gulfiroş li wir dimîne
Li gel wan pereyên ku digindirin
Li gel wan gulên ku diçilmisin
Li gel wî zilamê ku dimire
Bêguman, ev xemeke pir giran e
û gerek ew tiştêkî bike
Lê gulfiroş
nizane ka gerek çi bike
nizane ji ku dest pê bike
gelek tişt hene ku bike
li gel wî zilamê ku dimire
van gulên ku diçilmisin
û van pereyan
van pereyên ku digindirin
bêhedan digindirin.

Wergera ji fransî: Îbrahîm Xelîl



Hêza bexşandinê...

Armen Yerimyan

Jiyana min şehid e, mirina min e niha
Cotek tişt hene di vê cîhanê da
Ji bo kê bi ruhê serhişk va
Ez gelek gelekî giriyame.

Yek, birîna evîna kawgirtî ye
Ku min ew qenc kir bi alastinê va
Ya din, ji nefretê birîneke nedadayî ye
Ku heta îro ez xemkêşê derba wê me.

Bi qamçiyên giyan li min zêrandin
Ez ne jiyam, ne jî mirim
Lê bi çerçerenka min e mezin î şareza
Ruhê min qîriya: Estefxulla!

Min ji bexşandina xwe fahm kir
Ku kê derb li min xist min jê hez kir
Û bi sîleyên ji destên nerm
Min giyanê xwe ji qetlê rizgar kir...

Wergera ji ermenî: Seyrana Celad



Destpêka axaftinê

Adonis (1930-)

Ew zarokê ku demekê ez bûm
Yekcar bi min xerîb hat
Tu tiştê negot
Em hinekî meşîyan
Û me her duyan bêdeng awir li hev vedan
Gavên me
Dişibîyan çemekî ku xerîb xerîb diherike
Bi navê pelên biberbêketî û bi şaxan em civandin
Û daristaneke ku xak wê dinivîsîne û demsal wê av dide.
Em ji hev veqetîyan
Ey zarokê ku demekê ez bûm
Pêşve were!
Niha çi em civandin
Û em ê çi bêjin ji hev re?

Wergera ji erebî : Aydin Ekîn

Institut kurde de Paris



Li benda min bimîne

Rena el-Tûnisî (1981 -)

I

Dixwazin ez ji wan re dabaşa baxçe bikim
dixwazin ez li wir bilfzim
lê ez berhevkirina niftikan çêtir dibînim;
wan li kêleka hev rêz bikim
û dilê xwe bidim ber êgir

II

Li otobusê siwar dibim
destê xwe ji jibîrkirinê re li ba dikim:
li benda min bimîne

III

Dixwazim pirtûkekê ji zarokan re binivîsim
navê wê masî be
yan jî tu yê çawa tariyê nas bikî?
û wêneyê keçikekê
ku derî bi bawerî digire
û di rûpela duyemîn de
rûyê xwe di bin cilikê de vedîşere.
Dixwazim tu min bi xwe re bibî
em xwarinê ji malbatekê re bikirin
tu rûyê min bi ken
li ser maseya malbateke bextewar û xwerû xêz bikî.
Dixwazim bi te re bimeşim û tu min dibî ku bibe.

IV

Zehmet e ku ez helbestekê binivîsim
û tê de behsa daran nekim...
çolistan her tim dilê min dadigire.

Wergera ji erebî: Besam Mistefa



Naxwazim tişteki ne peyvan ne rastiye - Não quero nada nem palavras nem verdade

Fernando Pessoa (1888 - 1935)

Naxwazim tişteki, ne peyvan, ne rastiye.

Yek û ya din, ka ew çi ne?

Perçeyên qutkirî, ji rastiye

Kêliyên diyastolayên ji dil.

Naxwazim tişteki. Fikirim heta ku êdî nefikirim.

Min xeyal kir heta xwe girêbidim ji tirsan

Bi perçeyê herî piçûk ê ezman an jî deryayê

Tenê ji bo hebûnê û ji bo vê yekê ew min natirsîne.

Têkiliya bêkêr a di navbera kî û çi me de,

Metafizîka derewîn a hestên mirî ye...

Naxwazim tişteki. Ez parsekekî kor im ku lê

Dixim, li gundekî çolê, li hemû deriyan...

13/05/1932

Wergera ji portekîzî: **Ûrfan Kenî**

Institut kurde de Paris



Gelek gelek kes hene - Many and more

Maya Angelou (1928 - 2014)

Gelek gelek kes hene
ku karîbûn ramûsin destên min
tehm bikin lêvên min
û germahiya canê wan bibe deyn
ji bo tenêtiya min.

Daxwaziya min hogirek e.

Kêm û kêmtir kes hene
ku karîbûn bidin min navê xwe
û serweta xwe, yan jî
lawên xwe tavilê bişînin cem min
hinga ku nexweşa nava ciyan bim.

Hewceyî hogirekî me ez.

Tikîtenê yek heye, tayekî bi tenê
wê ji cergên xwe yên qels
nefeskê bide min
ji bo xwenûkirina canê min.

Û ew tayê bi tenê, evîndarê min e ew.

Wergera ji îngilîzî: Yonca Sarsilmaz



Maçkirina bi Vietnamî - Kissing in Vietnamese

Ocean Vuong (1988 -)

Dapîra min û maç bike
tu nabê qey bombe li ber teqînê ne, li hewşa paş xênî
ciyê ku pûng û asmîn tenteneya parfûmên xwe
dî pajika aşxaneyê re dadiweşînin
tu nabê qey li ciyekî laşek ji hev dikeve
û rivînan daye ser rêya zivirînê
dî nava hûrgiliyên aloz ên ranê kurikekî re
tu nabê qey ku tu ji derî derkevî
divê qurmê lêş
ji ber birînên derketina perçiqan semayê bike.

Dema dapîra min maç bike
ne mirçemirça beloq heye
ne jî muzîka roavayî ya lêvmiçandinê
ew maç dike da ku te bi hundir ve henase bike
zora poz li rûçikê dide da ku ji nû ve li bêhna te hîn bibe
û xwêdana te di pişikên wê de
rengê moriyan, bibe dilopine zêrîn
tu nabê qey gava ew te hambêz dike
mirin jî di ber re
bi gûzika destê te pihêt girîye.

Dapîra min hingî maçî dike, tu nabê qey dîrok
tu carê neqediyaye, tu nabê qey
li ciyekî
laşek
ji hev dikeve, hîn.

Wergera ji îngilîzî: Azad Ekkaş



Spîtiya berfa - Snövit

Harry Martinson (1904 - 1978)

I

Ji bo motmotkên spîtiya berfê ez nêçîr im
hejandî, di devê newalan de ji aliyê roviyê
cemserê yê zivistanan ve.

Berfekorikî û mirîşkeke zeraqînî.

Nûnêçîrkirî, qutifî, peyvên baş hîlbijartî.

Her tiştên çarmedorê pir xweşik in.

Çavê min ê mirîşkî li ezmanê girê ji berfê

ez coşbûyî û şevreşkî vedimirim

li qeşaezmanên şînbûyî yên newalê.

II

Berfa spî

çîma ew qas spî

li ser rojbixwîneke dinyayî datînî.

Çîma ser her tiştî digirî.

Ez ji bo te distirêm

mîna berfeke qelp.

Bêparastin dibarî tu.

Bêparastin ji ewrên şîngeşayî

ji bo axê pakiyê kom dikî.

Pakî ji dûr ve tê ditin.

Lê îro tu tişt nabe bersiv

li beramberî vê daristana bi spîtiya berfê

ku wisa nûûtîkirî û paqij

xwe ji bo warên sembolan xemilandiye.

Berfa spî ya bêmal.



III

Berî mirov kor bibe çend rojên bi xweşî
dî vê zivistana ramanî ya pak de bijî
jixwe bager bi tena serê xwe distrê
û ev cîhana heqîqî ya qerisî
digel fetlonekên xwe yên spî têne rastkirin...

Ajalên xweşik peyda dibin
ku ji bo van salonên spî hatine afirandin:
kîvroşk û kundên ji berfê
ku bêdeng daran diguherin
kulîlka bûka nîsanê li dûr dihele.

Wergera ji swêdî: Serkan Birûsk

Institut kurde de Paris



ji Dîwana Kebîr xezela 2922

Mawlana Celaleddînê Rûmî (1207 - 1273)

tu hem bedew hem şerab û hem nûr î
hem di destpêka zivistanê de bihar î

dişewitin ji ber eşqa te li her derî
sed hezar tav û zivistan bal û perî

dema agir ji te hû dike hinava neyê
ji ber hewesê vedguhêre şekerneyê

te sed hezaran ser birrîn bi eşqa xwe
can newêre bêje û bipirse heyfa xwe

ji ber çavên bedyûman dildayên te
di bin erdê de ava dîkin malên xwe

lew nîn e hîç şikence bêtir ji zanîne
weyl li wî ma di navbera xerab û çê

ew delalên Misrê li ber te bê hiş ketin
birrîn wan dest û pêçî ax û wax negotin

şeva mîracê Şah heyran ma û xewisî
wisa derbas kir wî rêya sed hezar salî

ha bişkêne tu bi badeyên serxweşan
ji dest û pê wan dar û qeyd û bendan

Şemsê Tebrîzî tu me bimehîne
lewra ku tu hetav î û em sîtavî ne

Wergera ji farisî: Sînan Gavgûr



Pîre espî bareber - Den gamla arbetshästen

Ingela Strandberg (1944 -)

Pîre espî bareber
Qît rawêsta
Ta çaw bibrête xoretaw

Derwazeyek kirayewe
Berew axurêk
Pêştir pêy nenabuwe nawî
Çeşnî aw
Xuşî û royî
Be naw dîwarî sipî da û
Bazî da derewe
Ruwew rûbarê le esp
Hawaheng û le yek kata
Be espayî bejniyan dehejand
Legiwên karwanî şîngêrî

Be naxî şewa
Rîz
Be rîz

Çîdî ew espêk nebû
Bibuwe hemû espekan

Ya
Hîç kamiyan

Ber le hemû şîtêk
Hî hîç kesêk

Wergêranî le swêdiyewe: Bawar Breinholt



Wekî zarokekî

Hamo Sahyan (1914 - 1993)

Wekî zarokê ji nê nê xeyidî
Bikim nekî li nê dimeyînim
Xew li min çûye, lê tu wer bibîne
Ku ji balgehê direvim û li balgehê dinêrim!

Mî ji bo her kesî, her tişt kir
Ez rûniştîm û li heqê karê xwe yê mî kirî dinêrim.
Mî serê xwe yê dîn kire nava kefa destê xwe
Li vegerandîna rojên xwe yê borî dinêrim.

Wergera ji ermenî: Vrezh Kosayan

Pizrûkên berfê - Dust of snow

Robert Frost (1874 - 1963)

Bi awayê qijalkê were
Pizrûkên berfê
Bi ser min de bihejîne
Ji dareke kajê

Dide dilê min
Xulqê guherînekê
Û min rizgar dike ji çend danê
Rojeke ku poşman bûme jê

Wergera ji îngilîzî : Azad Rêbiwar



Tiştta ku dê xewnê nêzîkî rastiye bike, dubarekirin e

Miqdad Xefîl

Xweha min

Xweha min

a wekî libeke hinarê geş

yan wekî bûkikeke kej

û bedew

ku bav û birayên min dil ketinê wekî ku sêr ji wan re çêkiribe û wexta xwe giş di ramûsana wê de derbas dikirin.

dî sala pêşî de (yekane sala wê ya di jiyane de)

Bizîşkê navdar wê çaxê li paş perdeyeke xwelîreng û veqetîner ku wekî dîwarekî di navbera jiyana û mirinê de

ew bend kir.

Şeşgoşeyên textik

Bêhna rengê spî û rengê avê ji mala wan tê

û qiyametê gul û rûbereke ji mermera şuştî jî tê de hene.

Navê kûçik "co" ye û wî alîkariya her du xwediyên xwe yê wêrek dikir.

Pir zehmet e ku ez ji van şeşgoşeyên textik tiştêkî ku bi nav bibe durist bikim..

Belê dizanim tu jêhatî yî û kîncên te li vê êvara havînî ya dilgerm digunce.

Wa ye li ser hezkirina kor zêde galegalê dîkin û bi nefesberdanan siberojê tînin bîra xwe.

Ez ê li cadeya ezmanî li tîlîsma berçemokan guhdarî bikim

û li jorê, li ser serê xwe ez ê gulleyên axê biteqînim.

Çemê mala duyem

Cîranên wî nêçîra qûma hûr û mirinê dîkin.

Min tê de keştiya xwe dît;

li jora wî jî ser hişê xwe çûm

û destekî zordar û nexuya em ber bi ebediyetê ve dehfandin.



Pêlîstokçêker

- Pêlîstokên biçûk ji heriyê çêdikim
û di ber re xweha min ji min dipirse:
Bira, tu çi dikî?

Di bixêrika axî de min pêlîstokên xwe da xweha xwe da ku sebra xwe bi wan bîne
di çaxa min heriyê çaktir dida ser hev qene jê yeka ku ruh tê de hebe biafirînim.
Bira, kanîn pêsîrên wê û kurekura dêya min?
di wê navê re min çar nigên tebût jê re danîn.
Kanî hêk û ka, spiyan serê min xwarin.
Birê min, ma birra bavê min miriye?
Li hewşê, bi pisîkeke ji heriyê min xweha xwe veciniqand û di navberê re pisîkeke bi
xemil xwe nêzîkî wê kir û di ber re xweha min digo, lê binêre wa xwe dilivîne.
Birê min, ma birra bavê min miriye?
Min pêlîstokên xwe şanî ezman dan pê re jî dilê xweha min şa bû û zarokan ez bi hesa-
bê xwedê yê çavbeloq tirsandim.
di ber xwe de dikeniya xweha min: de pîvazeke sor jî têxîne devê wê.
Şivan bi tevî miyên xwe heliyan û zarok bi wan kenyan û av jî ji zendikên porê wan ên
kin diniqutî.
Di guhê min de pispisand xweha min:
De ka em şêraniya heriyê bixwin;
min bêriya lîska di hundirê qula rovî de kiriye ku bavê min ew ji balîfên me yên dirêj
çêdikir û di ber re jî ber bi derazînka derî ve xişiyam.
Bira, dilê min dibije keskesorê.
Barîna ezman a risasreng pisîka min ji hev de xist;
îcar bi ser xwe de çilmisî û heliya.
Giriyê min tê;
Biryê min: ji bo xwedê vê baranê vemirîne.



Ji min hebû

Ji min hebû ku ev şûna tiliyê ya bi xwîn a wî karkerê han e ku bi fediyêke hayedar derbasî hucreya min bû û benek ji jêdera kehrebê jê kir û ji ber hayedar bû ku xewê li min netewirîne, di mista destê xwe de ji birînekê xafil bû û perçeyek ji xwîna wî bi eniya derî ve şîrêz bû.

Ev yeka han ravekirineke mentiqî ye ji jêdera lekeya xwîna li ser derî û tiştê ku vê yekê piştrast dîke ew bû ku min birra yê karker dît û ew derbasî hundir dibe çaxa ku ez di navbera şiyariyêke revok û rêzeşevbestine zordar de avetî bûm.

Ev bi xwe ravekirineke mentiqî ye lê sûretê yekem ê ku zora xwe da ser ravekirina xwînê ew bû ku teyrek ji kovaneke bi saw şemitî û li bin guhê siftiya dîwar ket û di hinavê dirindeyêke nebûnî de belawela bû û pê re jî şûneke bexwedî li dû xwe hêla. Di navberê de her wiha ihtîmaleke dinê xwe rakîşand ew jî ku lawikekî çavfireh, xwas, kincriziyayî, porgever û bi zîrektî û hedaneke xuya beraneka xwe ya ku wî xwe bi xwe ew selixandibû- li ser rengê derî yê vekirî danî.

Sistiyêke dilteng diherike laşê min û êşa demdirêj nivînê xwe li aliyê eniya min ê çepê radixîne.

Di navbera hundir û hewşê de diherim û tîm, xwe diavêjim bextê sobeyê û dilbijîna xwarinê ji xwe dûr dixim.

Gustîlka zêr a nêrane û mezin a di qilçeka dêya min de, di hundirê serê min de digindire û bi xwe re jî min gêj dîke

û sîkên beytikan û dartûyê li derve li ser serçermê deriyê min dihejin.

Wergera ji erebî: Cîwan Qado



Evîn tê û evîn dihere - Kärleken kommer och kärleken går

Nils Ferlin (1898 - 1961)

Evîn tê û evîn dihere
Tu kes nikare qanûnên wê fêm bike
Lê dixwazim zivistan û biharê te bişopînim
û hemû rojên jiyana xwe.

Dilê min ê te ye
dilê te yê min e
û ez ê tu caran dev jê bernedim.
Kêfxweşiya min a te ye
Kêfxweşiya te ya min e
û dema tu digirî girî yê min e.

Evîn bi awayekî derasayî xurt e
serî ji tu tiştêkî re dananiye li cîhanê.
Gul di axa herî hişk de aj didin
Mîna rojê li ser çîtên tarî.

Dilê min yê te ye
Dilê te yê min e
û ez ê tu caran dev jê bernedim
kêfxweşiya min a te ye
kêfxweşiya te ya min e
û dema tu digirî girî yê min e.

Wergera ji swêdî: Salih Agir Qoserî



Biçûkiyek - Eine Kleinigkeit

Erich Fried (1921 - 1988)

Ji bo Catherine

Ez nizanim hezkirin çî ye
lê belkî
tişteki wiha be:

Gava ew ji derveyî welêt tê malê
û bi şanazî ji min re dibêje:

“Min cirdekî avê dît”
û bi şev gava ez şiyar dibim, ev gotin têne bîra min
û roja dîtir jî li ser kar
û ez careke din dibim dildarê bihîstina heman gotinan
û piştî jî
ew ê dîsa wisa rast li ber çavên min xuya bike
bê çawa dixuya
gava wê ev yek digot -

Ez dibêjim, heye ku hezkirin ev
yan jî tişteki gelekî nêzîkî vê be.

Wergera ji almanî: Asya Xerzan



Şeş Haîkû

Jack Kerouac (1922-1969)

ka weca çî girt —
gîş rijîya behrê çû
taviya vê şiliyê

*

li ber tava şîrîn
wêdatir e ji şibaka dêrê
çengên perperokê

*

şevê dayê
çav tarî bûn li min —
rûpelê li ku yî

te heye kum
hetaa êvara xwedê —
serrût î belê

*

ji kar derket
di ber leyzgehan ra borî
karsazê tenê

*

dikare bibîne
her pisîka li Kiyotoyê
di nav mijê ra jî



Wergera ji îngilîzî: Sidîq Gorîcan



Kawik - Le cancre

Jacques Prévert (1900 - 1977)

Bi serê xwe dibêje na
lê bi dilê xwe dibêje erê
dibêje erê bo tiştên ku jê hez dike
lê ji mamoste re dibêje na
şîpya ye
pîrs ji wî têne kirin
û hemû pîrs û girêk jixwe hatine vepirsîn
ji nişkê ve kenekî dînoke pê digire
û her tiştî jê dibe
hejmaran û peyvan
mêjûyan û navan
hevokan û xefikan
û tevî gefên mamoste
û tevî şîrreşîrra zarokên bilîmet
bi temeşîrên ji hemû rengan
li ser depê reş ê bextxerabiyê
xêz dike rûyê bextewariyê.

Wergera ji fransî: Kevokê

Institut kurde de Paris



Strana Evînê ya J. Alfred Prufrock - The Love Song of J. Alfred Prufrock

T.S. Eliot (1888 - 1965)

*S'io credesse che mia risposta fosse
A persona che mai tornasse al mondo,
Questa fiamma staria senza piu scosse.
Ma percioche giammai di questo fondo
Non torno vivo alcun, s'i'odo il vero,
Senza tema d'infamia ti rispondo.**

Ka nexwe em herin, ez û tu
Dema êvar vedigire asîman,
Mîna ku nexweşek tezanî be li ser text,
Ka em biborin di kolanên nîvخالî re,
Nimenim xwe vedidin
Ji şevên bêxew li otelên yekşev î erzan,
Û ji xwaringehên bi qalîkên îstîrîdye tozgirtî
Kolanên ku wekî gotegotên xapînok diherikîn
Te ber bi pîrseke bêrehm ve dibin...
Ax, nepirse, "Ev çi ye?"
Ka nexwe em herin û serdana xwe bikin.

Di odeyê de jin tîn û diçin
Qala Michelangelo dikin.

* Ev epîgraf jî "Inferno"ya Dante ye. Di teksta resen de jî bi îtalî ye. Wergera wê jî îngilîzî û bi danberheva îtalî hatiye kirin:

*"Eger min bawer bikira ku wê bersiva min bigihêje
Wan kesên ku venagerin dinyayê,
Ew çirûsk vemirîya û êdî nelîviya.
Ji ber ku tu kes sax venegeriyaye ji wê çalereşê,
Eger ku ya dibihîsim rast be,
Ez ê bersivê ji rûreşiyê bêters bidim."*



Ew mija zer a ku xwira pišta xwe bi camên pencereyan dişkîne
Ew keldûmana zer a ku lûleya xwe li camên pencereyan dibe û tîne,
Quncikên êvarê bi zimanê xwe alast,
Xwe mijûl kir li ser birkên çiravik,
Hişt ew teniya ku ji kulekê tê xwarê bibare ser piştê,
Ji eywanê xijikî û ji nişkê ve veciniqî,
Û gava dît ku şeveke Cotmehê ya nerm e,
Xwe li dora malê guvand ser hev û kete xewê.

Û bêguman wê dem hebe
Ji bo keldûmana zer a ku li kolanê diherike,
Û xwira pišta xwe bi ser camên pencereyê dişkîne,
Wê dem hebe, wê dem hebe
Ji bo amadekirina rûyekî ku bête gel hev li gel rûyên tu lê rast têyî;

Wê ji bo kuştin û afirandinê dem hebe,
Û wê dem hebe ji bo hemû karan û rojên destan
Ew destên ku pirsê hiltînin û datînin ser sêniya te,
Dem ji bo te û dem ji bo min
Û dem ji bo sed dudiliyan
Û ji bo dîtin û vedîtinan,
Berî wergirtina tost û çayekê.

Di odayê de jin tîn û diçin
Qala Michelangelo dikin.

Û bêguman wê dem hebe
Da bipirsim xwe bi xwe, “Ez biwêrim?” û “Ez biwêrim?”
Dem ji bo daketin û hatina xwarê ji derîncekan,
Bi lekeya keçeliyê ya di nava porê min de-
(Ew ê bêjin: “Porê wî çawa tenik dertê!”)
Sakoyê min ê spêdê, berstûka min bi erzinga min ve zeliqiye,
Qrawata min a maldar û maqûl bi derziyeke sade hatiye girêdan-
(Ew ê bêjin: “Dest û lingên wî çi lawaz in!”)
Gelo ez biwêrim



Gerdûnê aciz bikim?
Dem heye di xulekekê de,
Ji bo biryar û sererastkirinên ku xulekek serobino bike.

Ji ber ku min ew hemû nas kirine, hemû bi tevahî:
Min êvar, spêde û nîvro nas kirine
Bi kevçiyê qehweyê min temenê xwe pîvaye;
Bi payîza mirî nas dikim wan dengên ku dimirin
Di bin muzîka dî binê mezeleke dûrtir de.
De ka ez çawa texmîn bikim?

Jixwe min ew çav nas kirine, hemû bi tevahî-
Ew çavên ku te
bi hevokeke hûnandî durist dikin
Û gava ku ez tîm hûnandin, vezeliyayî me li ser derziyekê,
Û ez tîme daliqandin, li ser dîwarekî tîme simandin,

Nexwe ez ê çawa
Singên di roj û rêçên xwe de derînim û tif bikim?
De ka ez ê çawa texmîn bikim?

Ji mêj de min nas kirine ew zend û bend, hemû bi tevahî-
Zendên spî û tazî yên bazinkirî
(mûzerkên wan diyar dibin li ber çirayê)
Ma ev bêhnxeşî ji kirasekî ye
Ku min ji ser hemde min dibe?
Min nas dikir ew zendên ku li ser kêleka
textekî dirêjkirî, yan jî bi şalekê nixamtî.
Û gelo ez hingê biwêrim?
Û gelo çawa dest pê bikim?

Ma divê ez bêjim ku ez êvarê diborîm di kolanên teng re
Û min li dûmana cixareyên dînemêrên bi gumlek nêrî
Ku pişta xwe dayî pencereyan?



Diviya ez cotek pencên kevjalêkê bûma
Ku li ser rûyê deryayên bêdeng dibeziya.

Û berê êvarê, êvarê, çawa serî daniye xewa şîrîn,
Bi tiliyên dirêj, nermijandî
Çav li xewê... westiyayî... qestîka nesaxketî,
Xwe dirêj kiriye li kêleka min û te,
Ma divê piştî çayê, kek û berfeşîrê,
Hêza min hebe ku wextê bigindirînim ber bi kendalekî ve?
Her çend ku ez giriyam û min rojî girt, ez giriyam û min nimêj kir,
Her çi qasî min serê xwe (piçekî keçel bûye) li ser sêniya pêşkêşkirî dît jî,
Ez ne pêxember im, û ev ne serêşanek mezin e;
Jixwe min dîtibû bîska mezinahiya min dilerize,
Û min dîtibû Qasidê Mirinê qapûtê min hildigire û hîlehîl dikene,
Û bi kurtasi ez tirsiyabûm.

Û qey li ber ket piştî her tiştî,
Piştî fîncanan, piştî rîçalê û çayê,
Dî nava ferfûrê de, dî nava hin sohbetên min û te de,
Wê hêja bûya
Ku bîskekê bi rûkenî me gezek li mijarê bida
Ku me gerdûn bi ser hev de biguvaşta ta bibûya topek,
Û da ku me ew berev pirseke bêrehm ve gêr bikira,
Da ku bêjim: "Ez Lazarus im, jî nava miriyan têm,
Têm ku bêjim we tevan, divê ku ez bêjim we tevan"-
Eger yek, balîfka li bin serê wê rast bike
Divê bêje: "Qesta di dilê min de bi tu awayî ne ew e;
Ne ev e, çi jî biqewimit!"

Û ma dawiya dawîn wê li ber biketa,
Wê hêjayî bîskekê bûya,
Piştî rojên li ber ava, piştî hewş û kolanên ku dividivokên baranê lê kirî,
Piştî çirokan, piştî fîncanên çayê, piştî etekên
Ku mehfûran dimalin-
Û ev, û gelek tiştên dîtir-



Vêca ez nikarim a dilê xwe bêjim!
Mîna lambeyeke efsûnî ku ruh û can avêtiye ser perdeyê:
Ma wê hêjayî bîskekê bûya,
Eger ew xatûn li ser balîfekê rûne
Yan şalê ji ser milê xwe biavêje,
Divê berê xwe bide pencereyekê û bêje;
“Bi tu awayî ne ev e.”
“Ya di dilê min de tu awayî ne ev e!”

Na! Ez ne Prens Hamlet im, ev ne nivîsa li eniya min e,
Ez lordekî hevalbend im, ew çêdibe
Ku şanoyê sererast bikim, du yan sê perdeyan bilîzim
Şîretan li prens bikim, bêguman ew hêsan e,
Rêzgir e, şa ye ku bête bikaranîn,
Şareza, çavvekirî, û sexbêr e;
Tûrikê wî tije gotinên fesîh in, lê ji jîrtiyê piçekî bêpar e;
Hin caran, bêguman, hema bêhişekî neçar e.

Ez kal dibim... Ez kal dibim...
Divê ez delingên pantorê xwe lê hildim.

Ma divê ez porê xwe berev paş şeh bikim? Ma ez diwêrim wê fêkiyê bixwim?
Divê ez li peravê bimeşim, şalê xwe yê spî û keten li xwe bikim.
Ez dengê periyên avê dibihîsim, stranan diavêjin ber hev.
Ne bawer im ku ji min re stranan bistrên.

Min dîtîbû ku ew li pêlan siwar bûne û çûne ber bi deryayê ve
Berev paş şeh dikin porê spî yên pêlan
Dema ku ba lê dide, reş û spî dibe av
Em di odayên deryayê de man vêgav,
Li gel delalokên deryayê yên bi mircanên sor û zer xemilandî,
Heta ku dengê mirovan me şiyar dikin û em dixeniqin.

Wergera ji îngilîzî: Arya Bayram



Şewa serde ya zimistanî de

Nima Yushij (1895 - 1960)

Şewa serde ya zimistanî de

Ocaxa tija mi zî nêveşena sey ocaxa lambaya mi

Û sey lambaya mi

Ne roşnî kena qet yew lamba

Ne zî şewla aşme ke asmênî ra beriçîyena tesîrê cemedî kena.

Mi lambaya xo tafînaye ke wa cîrana mi bêro û şêro şewa tarîye de

Û şewaka serde ya zimistanî bîye

Va tadîyenê hêdî-hêdî beyntarê daranê çamî de

Û beyntarê lemeyanê bêvengan de.

Mi a vindî kerde, na pîyare de mi ra cîya bîye

Gelo hema zî yena vîrî na hîkâye

Seke lewan ra aliqnaye yê nê qalî:

“Kamî veşnayo?” û “kam veşnaye yo?”

“Kamî na hîkâye zerrîya xo de pêser kerda?”

Şewa serde ya zimistanî de

Ocaxa tija mi zî nêveşena sey ocaxa lambayê mi.

Fariskî ra açarnayox: **Newzad Valêrî**



Dagerîna Şevê di Parzemîna Rojê de

Sheida Mohamadi (1976 -)

Morî xwe li ser sînga te rêz dîkin
û şeva tarî xwe berdide ser çermê te
û parzemîn ber bi canê xwe ve, canê wî ve dadigere
û tu li dora parzemînê dadigerî
digerî, digerî û hey digerî
di navbera Nîjerya û Xertûm*ê de

Morî li ser sînga te ya geş
nexşeyeke reş xêz dîke
û sînga te dînepixe û dadikeve
hilmê dikişîne li jêr xala
Tengava Hirmizê, Kendava Farisê
û morî li ser rûyê hilma te di du refan de rêz dibin

Û şev di awirên te de serobino dibe
tankêr difîkînin
keştiyên cengê topan dibarînin
û rehên canê te yên şîn...
Ax... ax... şîn
li derdora parzemînê digerin
Ax... ax... şîn
tu çî qasî bi qermîçok î
nexşeya rojê

Wergera ji farisî: Ebas Mûsa

* Xertûm, paytexta Sûdanê.



Odeya Spî - The White Room

Charles Simic (1938 - 2023)

Piştirastkirina tiştê berbiçav
Karekî stem e. Gelek hez
Ji nepeniyên dîkin. Ez jî wisa bûm
Min guhdariya daran kir.

Wan razek hebû, çi nemabû
Ji min re xuya bikin -
Lê paşê wisa nekirin.

Havîn hat. Her dareke li kolana me
Şehrezadeke xwe hebû. Şevên min
Parçeyek bûn ji çîrokên wan ên kovî.

Em diketin xaniyên tarî
Her carê bêtir xaniyên tarî
Huş û kavi bûn.

Li qatên ser, kesekî
Çavgirtî hebû.
Tirs û xema wî
Nedihişt ez binivim.

Rastî rût û sar e
Jinekê got, ew jina her dem
Spî li ber xwe dike
Ew ji odeya xwe derneket.

Institut kurde de Paris



Rojê tiştêk an du nîşan kirin
Ku piştî şeveke dirêj
Bêziyan xelas bûyîn.

Tiştên herî hêsan
Di zelaliya xwe de stem e ku bêne têgehiştin.
Çi bêzarî jî çênekirin.
Rojek bû ji rojên ku xelk
Jê re dibêjin XWEŞ.

Xweda xwe dikin şeweyê
Reşderziyên pirçê, neynika destan
Şeykekî diranekî wî ketî?
Na! ew ne wisa bûn.

Tişt bi tenê wekî xwe ne
Çavên xwe nazîvirînin, bédeng
Radikevin li bin tava ronahiyê
Dar jî bendewarê şevê ne.

Wergera ji îngilîzî: Jaff



Tu çûyî

Bedir Şakir Elsewab (1924 - 1964)

Tu çûyî û li dû te roj nema
Bû wekî roava
Weku te geşî ji tayên wê kişandin
Û siya pêpelûkan şikestin e
Wekî wê şikest, ewrên başûr dan ser xeyalên min.
Bi payîzan giran bûye.
Rezan xwe tazî kirine û cihok vemirîn, û xişîna
Pelan li darxurmeyan mir, û xaçerêk
Bi bêdengiya xwe, bendemayîn e.
Kilên çavên te reşahiya êgir.
Ji dilê te ditewire, ji bişkovên memikan
Gazî min dikin ger te awir veda: tu gurr bûyî.
Hey volkana ji gulan.
Xwezî min berê awirên te bida rojê
Bida siberojeke ku li ser xwîna min difire.
Kîjan asîmanî lerizîna stêran geş kiriye.
Û tarîtiyê xunavên baranê giran kiriye.
Te ji kûrahiya wê li min nêrî wekî ewran
Gul di mijdûmana wê de bi cî bûye!
Hey nêrîna ku bayê wê ez ji jehriyan revandim
Bo keviyê kesk li qeraxa çem.
Tê de xewr çûm min geş bike! Rivîné vemirîn!
Hey awirê ku dilê min bi werîsê asîman ve girêdide.
Spîbûna wê strana heyvê dijenîne.

20/1/1962

Wergera ji erebî: Alan Hemo



Ji bo Jane - For Jane

Charles Bukowski (1920 - 1994)

225 roj di binê giyayê de
Û tu ji min çêtir dizanî.
Wan wexteke dirêj xwîn ji te mijtin
Di zembîlekê de tu mayî darîkekî zuha.
Ma ev îş wiha dimeşe?
Di vê odê de
demên evînê
hêj sîberan çêdikin.

Dema tu çûyî
te hema hema her tişt bi xwe re bir.
Çongên xwe dişikînim dî şevan de
li hemberî pilingên
ku wê nehêlin ez bibim ez.

Tu her çî bûyî
Wê ev careke din nema rû bide
Pilingan ez dîtîm
Û ev êdî ne xema min e.

Wergera ji îngilîzî: **Botan Ozbek**



Hewayaya kemilî - Die gereifte Eva

Emerenz Meier (1874 - 1928)

Li warê fireh ê evînê
Dareke mûcîze kulîlk dibişkive
Li jêrê Hewa xewnê dibîne
Xewna herî xweş a jiyânê.

Ji mêr û zarokên xwe dûr
Ne qîz e lê xweşiktir e ji berê
Eger ew ji kurekî hez bike
Wê ji bihuştê bê avêtin.

Kulîlka herî xweş a bêgunehiyê
Ronahiya herî şîrîn a Gulanê-
Xwe ber bi wî ve xwar dike
Û wî ber bi dilê xwe ve dikişîne û dibêje:

- Ji min re evîna yekem çi bû!
Ji min re mêrekî kemilî çi bû!
Hezar mêr ji min re çi ne
Bi çermê pilingan hatiye pêçan! -

Ez ji te hez dikim gulpika şîrîn
Ew çend lertzok û ew qasî narîn
Ez ê ji bo te hezar caran bimirim
Tu ji bo min hunera rast î. -

Û bi bextewarî Hewayê ji bîr kir
Ketina yekem a mirov
Ew li ba Xwedê gunehkar e
Ji bo cara duyem û ya herî xweş.

Wergera ji almanî: Nûwar



Havîn li çiyayan - Sommar i bergen

Edith Irene Sodergran (1892 - 1923)

Hêsan e, havîna çiyayan;
mêrg gul vedide
ew baxçeyê kevn dibişire
û xuşexuşa ava çemê şêlo
behsa şadiya vedîtî dike.

Wergera ji swêdî: Anya Mîran

Sonatin*

Anna Greta Wide (1920 - 1965)

Bêhneke xweş dihat ji taxa gulan bi pêlan re
roj di nava aramiya nîvro re diherikî weku lehî be
û sohbeta kemanê ya bi kevnepiyanoyê re
ji her ahenga bi jan azad e.

Firiya mîna hehecikekê mijar
û wê kelegermê nekarî wê bihêminîne
pîvana herî bêxem a Do major
ku ebed bi kevnepiyanoyê nehatiye jenîn e.

Lê ji nişka ve bawêşînek hat bi hingura êvarê re
qedandin hîngê kevnepiyanoyê û kemanê
andante graziosa con amore**
û sonatina xwe ya kurt û ronîya havînê.

Wergera ji swêdî: Mizgîn Savci

* curebesteyeke muzîkê ya kurt û sivik e, pir caran ji bo piyanoyê.

** çûyîna bi narînî li gel evîne



Li dikana gulfiroşê- Chez la fleuriste

Jacques Prévert (1900 - 1977)

Mêrek dikeve dikana gulfiroşê
û hin gulan dineqîne
gulfiroş gulan dike guldeste
mêrik dest diavêje bêrika xwe
da pere derxe
û heqê gulan bide
lê pê re yekcar
ji nişkê ve
dest datîne ser xala dilê xwe
û tê xwarê
Tam wê kêliya ku tê xwarê
pere li erdê digindire
û gul dikevin erdê
li gel mêrik di heman kêliyê de
li gel pere di heman kêliyê de

Gulfiroş li wir ketiye tev
li nik pereyê ku digindire
li nik gulên ku digevçilin
li nik mêrikê ku dimire
aşkere ye ku ev dîmen kesernak e
û divê ew tiştêkî bike
lê gulfiroş nizane ka çi bike
nema zane
bê wê ji ku dest pê bike
Qewî tişt hene ku bike
li gel vî mêrikê ku dimire
van gulên ku diçilmisin
û vî pereyî
vî pereyê ku digindire
ku nasekine û digindire.

Wergera ji fransî: Yeqîn h.



Westiyame

Arpenik Charents

Îro dixwazim bi tenê bim
serê xwe hildim û wenda bibim
Birevim herim qet venegerim
Da ku ruhê westiyayî veşêrim

Ez ji tengasiyan westiyame
Dixwazim li bêdengiyê guhdarî bikim
Fîncana qehweyê bidim ber xwe
Ji bo veşartina hêsirên xwe.

Îro dixwazim bi tenê bim
Bila ruhê westiyayî rehet be
Ez niha bangên kesî naxwazim
Bêdengî, ez hewceyî bêdengiyê me

Jixwe canê min dişewite.
Bahozên berfê ez dorpêç kirim
Di nava baxçeyê dilê min re borin
Gul çilmisandin, bilbil cemidîn

Tu kesî bi gilî û gotinan aciz nekim
Sibê dibe ku xemgînî wenda bibe
Û ez ê dîsa bi ken li we vegerim
Da ku ramanên xwe yên nivco rêz bikim.

Wergera ji ermenî: Karîna Osêyan



Hate Ba Min

Selwa Ismaîl

Hate ba min
Bêyî stranên êvarê
Helbestên bi xunava ramûsanên şîl
Helkehelka bêhnekê
Ku nexşeya welat
Xêz dikir
Di penaberîya hemû temenê min de

Hate ba min
Bêyî tewtîhîna gavên me
Ji keftelefta çavan ji bo gihîştina piştî rojavabûnê
Û çîrokên deryayekê ku horîyan ew terk kiriye
Hembêzkirîna teyrikan
Ji bo lipeyketîna ewrê hêviyan

Tazî hat
Bêyî meya rezê me
Govenda sermestiyê
Li ser tengava min
Qulûzbûna laşê min
Û ristika morîkên ku di kêlîkeke dilbijokiyê de
Her libeke wê bi deverekê de çûn...
Bêbexto
Te awazên tiliyên xwe li ku hiştine?
Çîma birîqîna çavên te melûl bûye
Te çî bi lingê xwe kiriye
Ku pala xwe daye ser gopalê hêviyan û likumî bi ser min de tê

Wergera ji erebî: Rizoyê Xerzî



Ba Rûnî Bikemewe - Let Me Explain

Shook (1986 -)

Dway Neruda

De dey fermûn, biprisin:
Henar û heşîş û xurmakan
kenîşke genmirrengakan
kiwan?

Gwê bo em rûdawe hellbixen:

Beyanîyekyan killpey agrê
be pirrtaw le zewîyewe derperrî,
xellkî helllûşî,
şiqarteyek daygirsand ke wa
be pelepîtke le dronekanewe helldra.
sa îdî blîse ber dra û
qij hellkrrûzênra û
çiwarpel û goşt hellqirçênra
ew çete û gîrfanbirre nadyarane
le berzîy de hezar hengawewe,
bê demuçaw, bê raman, wirr
beder le firrefirr,
allay wirdîlaneyan leser nexşênrawe
le kîşwerî dûritrewe clewyan kirawe
le layen mindallan; mindalle çetekanewe
ewaney çaketî xwêndingeyan hellwasrawe
be kantorî dilldarekanyanewe,
ewaney be încilî nuştênraw û regênrawewe,
bo kuştinî mindallî dî hawêjeyan be asmanda hawêjawe û
xwêni geşî mindallekan leser cadewbanekan çorrawey bestuwe



Ne bînran û ne bîstran, milkeç bûn
rûn û rewan, çeşnî xwênî mindallekan

Dey wern biprisin: çima honrawekanî
nebuwete rengdanewey tenyayîye şarîyekeman û
leşî be xwaze xûsawman?

Hîç lêre nemawetewe şiyawî bînîn bê
hîç nemawetewe şiyawî bînîn bê
xwênî ser lim û şeقامî lê bitrazê
Hîç nemawetewe şiyawî bînîn bê

Wergêranî le îngilîzîyewe: Jiyar Homer

Institut kurde de Paris



A li vir im - Here I am

Charles Bukowski (1920-1994)

3yê serê sibê ye, dîsa serxweş im
piçek ma ku şûşeya 2yan a meyê biqedînim.
Li ser daktîloyê
min ji 12 heya bi 15 rûpel
bi helbestan dagirtin;
De kalemêrek e
li ser goştê canikan haredîn bûye
di vê sawgura li ber nemanê de
kezeba wî peritiye
gurçik jî diperpitin
şîlavkê bi xwe de rîtiye
xwînpest jî gihaye qata jor.

Di ber re, tîrsa salên badîhewa giş
ji nava pêçiyên min ve dikene.
êdî jinika ku bi min re bijî nîn e
ne jî Florence Nightingale heye da ku ez pê re
li Johnny Carson Show temaşe bikim.

Heke felcek li min bikeve
ez ê li vir şeş rojan dirêjkirî bimînim,
û sê pisîkên min ên wer birçî
wê goşt ji enîşk, gûzik û serê min jê bikin.

Radyo muzîkeke klasîk lê dide...



Min soz dabû xwe ku ez hew helbestên `mêrê kal` binivîsim.
Lê belê ev kesê han pir komîk e, wekî hûn dibînin, lome jê nabe.
Çimkî min hedê bikaranîna xwe ji mêj ve derbas kiriye
û hîn bêtir jê maye
a li vir sisêyê serê sibê.

Ez dikim vê kaxizê
ji daktîloyê derxînim
berdaxeke din dagirim
kaxizeke din têximê
û bi spîniya nû ya taze re bi hev şa bim.

Belkî bextê min careke din
spî bibe
pêşî
ji bona min.
paşê
ji bona we.

Wergera ji îngilîzî: Azad Ekkaş

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Salih Agir Qoserî / Nîwar / Rizgar Elegez / Samî Hêzil / Tengezarê Marîni / Yeqîn h.
Jiyar Homer / Mizgîn Savcî / Alan Hemo / Azad Rêbiwar / Kevokê / Seyîdxan Kurij
Ciwan Qado / Prîskê Mihoyî / Hebhînkarkê / Yasemîn Acer / Rifat Arya
Hoşeng Nizarî / Xurşîd Îlêwî / Selîm Nalî Gulfiraz / Îbrahîm Xelîl / Seyrana Celad
Aydin Ekîn / Besam Mistefa / Ûrfan Kenî / Yonca Sarsilmaz / Azad Ekkaş
Serkan Birûsk / Sînan Gaydûr / Bawar Breinholt / Vrezh Kosayan / Asya Xerzan
Sidiq Gorîcan / Arya Bayram / Newzad Valêrî / Ebas Mûsa / Jaff / Botan Ozbek
Anya Mîran / Karîna Osêyan / Rizoyê Xerzî

